

Kuştina jinan

Salih Cefer

Her ku ez di nava rûpelên malperên kurdî de nûçeya kuştina jinekê dixwînim, hestên min bi kûranî tên sotandin û gelekî tîm êşandin.

Naxwazim serê xwênerên xwe bi gotareke kilasîk li ser mafê jinê û sedema paşdamayîna wê binivîsînim û neji bidim xwiya kirin bê çî pêwistî divê ku jin ji zordarîyê rêzgar bibin.

Tiştê ku bala min digişîne , gava ku bûyerek siyasî diqewime, rûpelên malperan tijî nivîs û gotar dibin, lê gava ku gulek ji gulistana civaka me tê qurçifandin tu tiştêkî ji bilî kurte nûçeyekê nabînî, lê ya herî girîng ewe ku nivîskarên me bi tirsonekî nêzîkî vê yekê dibin û bi newêrekî rexneya civakê dikin, ji xwe hêzên siyasî tiştêkî nakin, ji bilî weşana wê nûçeyê.

Nizanim çima wa li ber dilê min kelîya ku divê mirov bêje werin em tiştêkî neyî kilasîkî bikin.

Eger bi rastî em dilşewatê paristina jinanbin divê em tiştêkî bo sivikirina vê zulmê bikin.

Gelo wê çiqas xweşbe ku rewşenbîr û siyasatmedar û hemû kesên pêşverû di nava civakê de piştî kuştin yan xwekuştina jinekê xwepêşandanekê ji navenda bajêr bi rêkin û bidin xwiya kirin ku em li dijî kuştin yan xwekuştina jinanin û em van kiryanan şermezar dikin û li dij derdikevin . Bi vê yekê wê helwest were xweya kirin û bala civakê bê kişandin ku em bi van kiryanan ne razîne, lê gava ku hemû kiryan derbas dibin wek ku tiştêk nebûye ev edet berdewam dike û zêdetir bibe.

Eger mirov tiştêkî nikanibe biguhere, bi kêmayî divê nerazibûna xwe diyar bik.

Eger rewşenbîr û siyasatmedar û hêzên pêşketî di civakê de li dijî vê qurçifandina gulan nesekinin, wê kî vê yekê bike.

Gelekî şerme ku di çerxê bîst û yekan de ji bo hezkirina di nava du kesan de mirovek bê kuştin.

Ta kengî wê jin werin kirin yan fîrotin yan bi darê zorê bîst dayîn û eger ew bêje na, gef lê werin xwarin û ev yek bibe sedema xwekuştinê yan xwe sewitandinê.

Divê em ne tenê îdî siyasatê bikin , divê em destên xwe bidin ser birînên civaka xwe, ne tenê bi nivîsandinan yan bi simînanan lê tiştêkî li ber çavan bikin , tevî ku wê dilê hinek fewdal û êlperest û olperest û alîgirên wan ji me bimîne, lê divê ev yek bê kirin.

Bese bêdengîya li hember qurçifandina gul û kulîlkan.

14.02.2010

Ev gotar ji malpera Avesta hatiye wergirtin

